

Û û 41 peyv

Û û Di alfebeya kurdî da tîpa 25 ane. Di alîyê dengnasîyêda tîpekî dengdêr, stûr, dirêj û glovere.

û g peyvekî gîhaneke û dikeve navbera çend gotin an jî hevokên wekhev û ên bi hevra têkildar.

ûcb m 1-veşartin, bincilkirin, serûbinkirina sedema rast 2-wesîle, bihane wesîle, bihane

ûçik n pîyê potên mîna îşlig, sako û wd

ûd Er. m amûrekî muzîkêye, dişibe sazê le zikê wî gir û doxa wî kin e di bin da du lib têt heye.

ûdçêker Er.-K. nd/nt kesên ku ûdan çêdike, diafirîne

ûdçêkerî Er.-K. nd/nt karê çêkirin û afirandina ûdan

ûdfiroş Er.-K. nd/nt kesên ku ûdan difiroşe

ûdfiroşî Er.-K. m karê firotana ûdan

ûdjen Er.-K. nd/nt kesên ku ûdan lêdixe, dijene **ûdvan**

ûdjenî Er.-K. nd/nt karê lêxistin, bikaranîn û jenandina ûdan **ûdvanî**

ûdvan Er.-K. nd/nt kesên ku ûdan lêdixe, dijene **ûdjen**

ûdvanî Er.-K. nd/nt karê lêxistin, bikaranîn û jenandina ûdan **ûdjenî**

ûf b di rewşa ecizbûn, nexweşîyê û nerihetîye da tê gotin

ûfeûf m ji ber ecizbûn, nexwaşî û nerihetîye pir zêde uf kişandin

ûfo m ûfo

uhrevî Er. rd axretî, bi dinya din ra girêdayî

Ûkranyayî nd/rd kesên ku endamê gelê Ûkranya yê û li wir rûndine.

ûltra Fr. rd asta herî mezin, herî bilind

ûltramodern Fr. nd (ji bo raman û teşe) ultramodern, di modernîyê da asta herî bilind

ûltrason Fr. m ultrason, lertzîna denge ku qasî ku bi frekansê pir mezin tê

ûltravîyole m ultravîyole, çirûskeyên mezinahîya pêlên wan di navbera 200-4000 angstromê daye, niha ji bo dermankirina hinik nexwaşîan tê çêkirin jî.

ûnce bot. m gîhakîye û sêpel e, li cîhê avî da hişîn dibe an jî ji bo alif bi taybetî tê ajotin **nefel**

ûr bj. n gireyên ku di çavîkên laşên zindîyan da her dem zêde û mezin dibin

ûrandin l qêrîn û nalîna lawirên mîna kûçik û guran a ku bin bandora tiştêkî da

Ûranûs Lat. ast. m gersitêrkekîye, di alîyê ji dûrbûna dinyayê da rêza 7. daye.

ûranyûm Fr. kîm. m elementekî kîmyeyîye, zêdedir di çê kirina çekên kîmyeyî de tê bikaranîn, sembola wî u, hijmara atomê 92, giranîya atomê 238,029, tîrbûna wî 18,7 e, û wek hesin dixwûye.

ûreûr m qêrîn û nalîna bê navber a lawirên mîna kûçik û guran

Ûris nd gelekî Slavîyê û li rûsyayê dijîn

Ûrisî m zimanê gelê Ûris pê diaxive

Ûriskî wek Ûrisan, tevgera mîna Ûrisan

ûrîn l qêrîn û nalîna lawirên mîna kûçik û guran

ûrkulî bj. m nexwaşîya ji ber birîna li mîdê çê dibe **ulser**

ûrmax bot. m navê gîhakîye

ûrt m mal, malbat, zarû

ûrtkor rd malbatên ku bê zarû

ûrtkorî rewşa bê zarûtûya malbatê

Ûtarîd Er.ast. m gersitêrka herî nêzîkê dinyayê Merkur

Ûyxur nd netewekî ji asya navîne, tirk vanan ji xwe re wek hevnetew dihesibîne

Ûyxurî m zimanê gelê Ûyxur pê diaxivin

Ûyxurkî rd/h wek Ûyxuran, tevgera mîna Ûyxuran